



folklorame

SPAS JI BO
ALÎKARÎYA WAN

Aydin Batur
Bîrgun Uzûm
DÎHA
Dûrzan Cîrano
Ferhat Arslan
Huseyîn Rodî Keskin
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Serkan Kûrt
Servet Tursun
Seyda Goyan
Surya Hûman
Tehsîn Baravî
Orhan Tanhan



Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 3

Hejmar: 11

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpirsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksiyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafik: Mustafa Akbaş

Fotoyê bergê pêş: Mûrat Adiyaman

Fotoyê bergê paş: Mûrat Adiyaman

Navnîsan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı

İktisadi İşletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.

Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com

folklorame

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsîyar e.




Pirtûka pêşnîyazkirî


Navê pirtûkê: Dûrikên Kurdî (Kurdistana Suriye)

Berhevkar: Selih Heydo

Weşanxane: Enstîtûya Kelepora Kurdî



Orhan Tanhan



Naverok

- 5 Ji edîtorî
- 6 Denhûrik, **Sosina Farqînê**
- 11 Cûcîk, **Hîkmet Yildiz**
- 16 Meseleyên Xoce Nesredîn, **Bêrivan Matyar**
- 21 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
- 22 Avkî, **Şehrîban Matyar**
- 24 Beyta Bedirxan Begê, **Yûsif Hêşetî**
- 26 Çend serpehatîyên Elîyê Gulêyî, **Zîya Mukrîyanî**
- 29 Cîl û Cemcîl, **Aydin Batur**
- 32 Hin îdyomên Erxenîyê-2, **Eşref Keydanî**
- 35 Lawko dîno, **Elîf Gunduz**
- 37 Meleko, **Remziye Oncel**
- 41 Mamika qîza paşê, **Firat Keklîk**
- 44 Metelokên bûk û xasîyan ji Devera Qelqelîyê, **Mehmet Yildirimçakar**
- 46 Tiştanokên Herêma Erxenîyê, **Nûredîn Vûral**
- 47 Dîzik, **Mîr Mûhargînî**
- 52 Danasîn û nirxandina pirtûka “Çîrokên Kurdî”yê, **Evîndar Şevîn**
- 57 Hinek bawerîyên gelî ji Anatolîya Navîn, **Nêrgiz Baran**
- 61 Lîstika gumbila gumbil, **Payîz Tursun**
- 63 Zihêrê marî, **Yakûp Taşçî**

Ji edîtorî

Hezkirî û şopînerên “Folklor Me”yê çavên we ronî, “Folklor Me”yê hejmareka din jî li xwe zêde kir. Bi xêr û xweşî be ji bo me tevan. Her hejmar bi serê xwe, kelecaneke dide me amadekarên “Folklor Me”yê. Ev kelecane me şad dike, karî li ber dilê me xweştir dike.

Şopînerên ezîz, di hejmara 10an da, me nivîsek çap kiribû bi navê “Hin Îdyomên Erxeniyê-1”ê. Hinek xwînerên me, ji me ra peyva şandin ku, ka gelo me çima peyva “biwêj”ê bi kar neaniye û me çima li dewsa têgiha biwêjê, tegiha îdyomê bi kar aniye. Herwekî ku hûn jî dizanin wekî gelek qadên din yê zanistê, qada folklorê kurdî jî bêpar e ji termînolojîyeka hevpar. Herçend Weqfa Mezopotamyayê ji bo vê mebestê xebatek dabû destpêkirin û heta radeyekê jî anîbû, mixabin nîvco ma ew xebat. Îcar ji ber nebûna termînolojîya hevpar; her kesek, kom û komxebat li gor zanîn û hizra xwe têgiheke hildibijêre. Me jî di çend hejmarên xwe yê borî da, ew têgih bi heman awayî bi kar anîbû. Divê em bizanin, têgiha navborî di zaravayê kirmanckî da îdyom e, di soranî da îdyom e û di kurmancîya Behdînanê da jî îdyom e; lê bes di kurmancîya bakurê da têgiha biwêjê berbelav û çalak e. Lêkoler Z. Ergünî di gotareka¹ xwe da li ser hin peyv û têgihan nivîsiye ku hin peyv çawa di soranî da xwedî maneyeka cuda ne, lê wexta derbasî kurmancî bûne, hin maneyên nû girtine û carinan jî bûne xwedî hin maneyên eletewş. Ergün, bi palpiştan dîyar dike ku têgiha biwêjê ne ji bo cureyeka folklorê hatiye bikaranîn, ji bo kesên helbestan dinivîse (helbestvan) û carinan jî ji bo kesên dinivîse (nûser/nivîskar) hatiye bikaranîn. Piştî ku li Ewrûpayê hin lêkolera jî bo cureya folklorê bi kar anîne, bi zanebûn yan jî bê zanebûn, ev têgih li bakurê belav bûye. Ji ber van tespîtên Ergünî, em jî qayîl bûn ku me xelet bi kar aniye ev têgih. Loma jî me wekî soranî, kirmanckî û kurmancîya Behdînanê têgiha îdyomê bi kar anî.

Hejmara me ya 11an wekî şîr û şerbetê şîrîn e; wekî “Avkî”yê ye hûn dê jê tîr nebin. Elîyê Gulê û Xoce Nesredîn dê we bikenînin. Taybetî Elîyê Gulê tîpekî pêkenokan e ku nayê naskirin. Bi xêra xebata Z. Mukrîyanî navê wî jî ket nava listeya tîpên pêkenokên kurdî. F. Keklîkî piştî navbirekê bi meseleyeka ku li ser mamikekê ava bûye, dîsa silav daye xwînerên xwe. Di vê hejmarê da ligel cureyên edebîyata gelêrî, baweriyên gelêrî, nixandina pirtûkê û listikek jî heye. Û wekî hemû hejmaran, xaçepirsa folklorê dîsa li benda we ku hûn wê dagirin. Di vê hejmarê da du nivîskar hene ku ev cara ewil e ew dibin mêvanên we. Em jî li ser navê xwe û we kêfxweş bûn bi xebata Mîr Mûhargînî û Payîz Tursunê.

Em hêvîdar in me hejmareka bi dilê we amade kiribe. Bihar ligel we, hûn ligel me, em jî bi miletê xwe ra... Herçend Newroz borî be jî, pîrozîya wê her zindî ye, qîmeta wê her zêde ye; loma jî hezar carî pîroz be. Bi kenê zarokan pêşwazîya Cejna Remezanê bikin û pîroz bikin.

Eşref Keydanî



1 Ergün, Z. (2021) “Çend Kêşeyên Veguestinê ji Kurdîya Soranî bo Kurdîya Kurmancî”, Nûbihar Akademî, No: 15

Cûcîk

Ji bo ku çîrok baştir bê fahmkirin, divê em behsa çend xalên giring yê li ser devoka herêma çîrokbêjê bikin. Ev çîrok, li Colemêrgê li gundê Zerenîyê hatiye berhevkin. Me hewl da ku çîrok çawa ji devê çîrokbêjê derketibe, wusa derbasî nivîsê bikin. Li Colemêrgê û nemaze di nava eşîra pinyanişîyên Herêma Kewîjê da heke tîpa “r”yê destpêka peyvê da nebe, gelek caran nayê bilêvkin ango di şûna wê da tîpa “y”yê tê bikaranîn. Ev cihên ku tîpa “r”yê berze bûne, ango wekî “y” derketîne min ev tîp reştir nivîsîn. Ev “r” zêdetir di nava peyvê û dawîya peyvê da berze dibe. Me ev “y” reştir nivîsîn.

Mînak: seyê xwe = serê xwe / gîyîn = gîrîn / beyan = beran / mêyik = mêrik...

Di hin bêjeyan da heke du tîpên dengdêr hatibine bal hev, ev jî nîşaneyê ve tiştê ye ku li wir jî tîpa “r”yê ketîye. Min ev jî reştir nivîsîn. Bi kurtasî divê ev tîpên reş hatîne nivîsîn wekî “r” bêne xwendin.

Mînak: haa = har / tendûû = tendûr / şeem = şerm / mecbûû = mecbûr / hee= her/ têtê = têt...

Xala duyem ya ku divê xwîner li ber çavan bigirin, tîpa “v”yê ye. Di vê herêmê da tîpa “v”yê jî gelek caran nayê bikaranîn û wekî “w” derdikeve pêşîya me. Min ev jî bi awayekî îtalîk

Hîkmet Yildiz

dest nîşan kirin.

Mînak: hawêtin= havêtin / şivan= şivan / mêwan= mêvan.

Xala sêyem jî ev e ku divê xwîner di xwendina vê çîrokê da mijara pirjimarîya navan jî li ber çavan bigirin. Li vê herêmê ku çîrok lê hatiye berhevkin, pirjimarî ne bi “ên”ê, bi “êt”ê çêdibe.

Mînak: mêvanên te = mêwanêt te / beranên min = beyanêt min / cilkên te = cilkêt te...

Heke xwînerên hêja di xwendina çîrokê da wan tiştan li ber çavan bigirin dê baştir jê fam bikin.




*Meseleyên
Xoce
Nesredîn*

Bêrivan Matyar



Xaçpîrsa Folklorê

◀ Oktay Altûn



“Ji bo bersivan li
rûpela 56’an binêrin.”

Ji çepê ber bi rastê

3. “Mîrov bi pîrsê diçeê” Li gor vê gotina pêşîyan mîrov cihekî nizanibe jî bi pîrsê dê bigihîje armanca xwe. Hin guhartoyên (varyant) vê gotinê ev in: “Mîrov bi pîrsê diçe Qudsê.” “Mîrov bi pîrsê diçe Exsê.” Navê herêmeka Qoserê ye, ji duwazdeh gundan pêk dihe.
7. Di rewşa fesadî û tevdanê da dihe bikaranîn. “Çima tu ketî ber gunehê wan, te navbera wan xera kir?” “Te dar di.....ê rakir.” Jîngeha mozan.
8. “Serî heye, dawî tune ye?” Di vê mamikê da qala gotinên nerast dihe kirin. Vir.
10. “Ma ez bi te nikarim, bi jî nikarim?” Tê maneya “Hêza min nagihîje te; lê hêza min têra vîna min heye û ez bi te ra danûstandinê nakim.” Cînavka vegerok.
11. Di destana Ker û da birayê Kerrî? Yek ji kurên Werdê û Silêmanî.
13. “Şîret li nabin.” Li gor vê gotina pêşîyan nesîhet li kesên zana nabin. Nesîhetkar.
14. Ev çem di Dîyarbekirê ra derbas dibe û li Başûrê Îraqê digihîje çemê Feratê û bi hev ra dirîjin Kendava Besrayê.

Ji jorê ber bi jêrê

1. Di nava baweriyên gelî da ev tevger wekî banga bêoxiriyê ye. Bi taybetî gava ku ev deng êvaran ji devê mirovan tê bihistin nebaş dihe hesabandin.
2. Di destana Dewrêşê Evdîyî da serokê eşîra milan û bavê Edûlê. Kesê ku Dewrêş û bavê wî Evdîyî, bi sondên xwe xapandine.
3. “Ji şekir şêrintir e, ji hesin girantir e?” Mamikeka belavbûyî ye. Rewşa raketinê/razanê... Bêhişîya ku mirov şevan dikevîyê.
4. Nexweşîyeka zarokan e û gava ku zarok bi vê nexweşîyê dikevin laşê wan sor dibe. Berê malbatan şaşîti dikirin û av nedidan zarokan; lêbelê şekir didan wan û bi vî şikilî jî gelek zarokan jîyana xwe ji dest didan.
5. Heywanekî kedîkirî ye, ji bo parastina pez û kerîyan alîkarîya şivanan dike. Se, seg.
6. Di Destana Zembîlfiroşê da kesa ku aşîqî Zembîlfiroşî bûye û dixwaze wî bixapîne. Jina mîrî, Banê Xatûn.
9. Karê hilgirtina tiştan. Bi taybetî kesê ku tiştên xelkê bi pereyan ji derekê dibe dereka din. Karê sî û çar şêhîdên Robozikê.
12. Navê listikeka zarokan e. Şerê bedenî ye. Du kom hene; bi fikê ling, çîp, zik, pişt, mil, sîng û hwd, kîjan der rast bihê li hevûdin dixin. Carinan hin derên însanan dişikên û hin caran ji dizivire şerê rasteqîn. Xweparastina bi lîngan “.....ê biavêje/lê bixe bila bikeve erdê.”
13. Firaqa avê ya ji axê çêbûyî. Kûz, kûzik, cer.



Avkî

Şehrîban Matyar ▶

Ji bo vê hejmara “Folklor Me”yê, me berê xwe da çêkirina “Avkî”yê. Avkî xwarineka gelêrî ye, bi qasî ku em dizanin li herêma Dîyarbekirê û li navçeyên wê dihê çêkirin. Dema me dest bi lêkolîna vê xwarinê kir, me bihîst ku li devereka Pasûrê jê ra “şilekî” û li navçeya Pîranê jî jê ra “şorik” dihê gotin. Lê em dê di vê nivîsê da berê xwe bidin navçeya Farqînê, gundê Çîçikayê. Li gundî jê ra “avkî” dihê gotin. Lê dibe ku li herêm û gundên deştê yên Farqînê navên wê yên cuda jî hebin. Bi gotineka din, em dê li gor agahîyên gundê Çîçikayê, behsa çêkirina avkîyê bikin. Li gor zarbêjê, ji ber ku hevîrê wê zehf tenik e, wekî avê ye loma jê ra avkî hatîye gotin. Herweha agahîyên din yên li ser vê xwarinê, em dê li gor zarbêjê bidin. Li gor wê jî du navên vê xwarinê hene; li Farqînê avkî û li Pasûrê jî şilekî ye.

Elîyê Gulê û çend meseleyên wî

Elîyê Gulê, li gundê Şewaşîyê yê bi ser navçeya Şemrexa Mêrdînê ji dayîk bûye. Di çar pênc salîya wî da bavê wî diçe ser rehma Xwedê. Bi navê dîya xwe “Gulê” tê nasîn. Piştî demekê ji ber pisgirêkên nava gundîyan mala xwe tînin navçeya Çînarê ya Dîyarbekirê. Elîyê Gulê du caran zewicîye û bavê neh zarokan e. Di fermana filehan da keçikeka file dibîne û wê xwedî dike, wekî zaroka xwe mezin dike. Elî, li Çînarê di sala 1985an da diçe ser rehma Xwedê. Elîyê Gulê debara xwe bêhtir bi dizîyê kirîye û demekê li gundekî Çînarê beqçîtî jî kirîye. Elîyê Gulê, zilamekî qerfok, henekbaz û civatxweş bûye. Ji ber ku kesên wê derdorê wî nas dikirin, kesekî dilê xwe ji henek û çêrên wî nedigirtin. Niha jî li civat û qehwexaneyên Çînarê hîna jî meseleyên wî tên gotin.



 Tehsîn Baravî

Me meseleyên wî ji zarbêjên cuda berhev kirine. Zarbêjê ewil, Elî Çaka' wisa behsa meseleyeka wî dike:

Elîyê Gulê tim diçû Qerejdaxê ji xwe ra pez mezê zekatê tanî. Rojekê ji Qerejdaxê vedigere, di rê da hurmetek henekê xwe pê ra dike. Elîyê Gulê dengê xwe nake, lê jinikê baş nas dike. Çend roj tê da derin karê wê jinikê li nifûsê derdikeve û tê Axparê.² Îja çima Elîyê Gulê wê nabîne, hema dere balê dibêjê:

“Wele ez te dişibînim hineka!”

Dibê:

“Tu ne jina Elîyê Gulê yî?”

Jinik dibê:

“Na wele, ez jina filankes im.”

Dibê:

“Na na, tu rast nabêjî. Eyn, tu jina Elîyê Gulê yî.”

Carek didu sisê jinik fam dike, dibê:

“Nebê Elîyê Gulê tu yî!?”

1 Me agahiyên li ser zarbêjan li gor, nav, paşnav, temen, rewşa perwedeyê, herêm û dîroka berhevkirinê dane: Elî Çaka, 37, xwende, Çînar/Dîyarbekir, 2019.

2 Axpar/Xanaaxpar: Çînar, navçeyeka Dîyarbekirê ye.

Mamika qîza paşê

Seyda Goyan

Firat Keklîk¹

“Bavê kal, ez aha çûme xazgînîyê
qîzekî, divê qelendê xu, xu birîye.”

Divê:

“Çi gotîye?”

Divê:

“Panzde berindîr bîst beran, sî şêr, çil
piling, pêncî hesp, şêst exte, heftê deve,
heştê qantir, newhêt aqil, sed firaset.”

Divê:

“Êja te çi got, tu çi divêjî?”

Divê:

“Temam, evana gişkî ew dikim.
Newhêt aqil, sed firasetî ku bînim?”

1 Zarbêj Adil Aslan ewilî wekî mamikê dipirse, dibêje; “panzde berindîr, bîst beran, sî şêr, çil piling, pêncî hesp, şêst exte, heftê deve, heştê qantir, newhêt aqil, sed firaset” çi ye? Kî dizane? Piştî ku guhdar bersiva mamikê nadin ev çîroka tê gotin.

Metelokên bûk û xasîyan ji

Devera Qelqelîyê

Mehmet Yildirimçakar¹



¹ Xwendekarê Doktorayê, li Zanîngeha Çewlîgê (Bîngol), Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.

Mîr Mûhargînî ▶

Đîzik


“Dewetê bigire û bi rê va here. Hema bi rê va tu çûy li ti derê nese, hema kilama bêje û dewetê bigire û bi rê va here!”

Weleh dewetê girt, o bi rê va hat. Hat wayê ferz kim berê nêçîrvan çûne nêçîra o tena reşandine li ser gola o ewk hatinê, tişt hatinê ku ji xwe ra bikujin. Mêrik [nêçîrvanek] jî di kozikê da ye, divê:

“Kuro xu deyne. Kuro xu wisa neke.”
Ew jî her deweta xwe digire. Ew jî, ji kozikê kewê wî firîyan. Go [nêçîrvan] hat hintirana dilê wî kir, lê xist

Danasîn û nirxandina pirtûka

Çîrokên Kurdî



Evîndar Şevîn ▶

Berhevkar û zarbêjê vê xebatê yek in. Feqî Huseyîn Sağniç, di vê xebata xwe ya berhevkarîyê da zarbêjê xwe ye. Helbet ev rewşeka pir mimkun e, em di pirtûka Cegerxwînî ya bi navê “Folklorê kurdî”yê da jî rastî vê rewşê hatibûn. Di ya Cegerxwînî da, berhevstran û kilam in; di vêya da çîrok in. Herçiqas, guherîn di stran û kilaman da çêdibin jî ne bi qasî çîrokan in, midaxele pir zêde li gotinên wan nabin, çimkî ew xwedî aheng û meqam in. Di çîrokan da mijar û bûyer neguherin jî vegotina wan li gor devok, ziman û vegotina zarbêj û çîrokbêjan diguhere, ji ber ku ji xeynî mijar û bûyera çîrokê vegotin hêleka pir mihîm e.

Hinek bawerîyên gelî ji Anatolîya Navîn

Nêrgiz Baran

1) Parastina dergûşê bi van awayan e.

Parîyekî nan, parçeyeka neynikê li nava paçekî bipêçî û bi dergûşê ve bikî, ew dergûşê ji çavan diparêze.

2) Mirov kêrê nade dastê hev.

Tê gotin ku mirov kêr da destên hev, mirov dibe dijminên hev.

3) Di ser dergûşê ra gav nayê avêtin.

Tê gotin ku mirov di ser pitikan ra gav avêt yan jî derbas bû, emrê pitikan qut dibe.



4) Kî nanê şewitî bixwe dê morîyan bibîne.

Tê bawerkirin gava yek nanê şewitî bixwe wê morîyan¹ bibîne.

5) Binê lingê dergûşê nayê maçkirin.

Tê zanîn ku binê lingê dergûşê bihê maçkirin, dê bejna wê qut bibe.

1 morî: bişkok.

6) Kesek tişteki nû bistîne, pê li lingê hevalê xwe dike.

Gava kesekî tişteki nû stand, pê li lingê hevalê xwe dike ji bo ku bibe qîsmetê wî jî.

7) Meresa² mirov divê serdev nemîne.

Tê gotin ku meresa mirovî berovajî bû divê bihê rastkirin yan na emrê mirovî qut dibe.

8) Zarokên ku şîrê dayikên hev bimijin dibin xwişk û birayên hev.

Carna ji ber nexweşî yan jî kêmayîya şîrê dayikekê, dayikeka din şîr dide dergûşa dayika kêmsîr, hemû zarokên wan dayikan dibin xwişk û birayên hev.

9) Divê parîyê nan li pey mirovî nemîne.

Gava mirov şîv yan xwarin xwar divê mirov parî û pirtikên xwarinê li pey xwe nehêle, gişî paqij bike yan na ew parîyê nanî li dinyaya din bi pey mirovî dikeve.

10) Di serşuştina dergûşê da stûyê dergûşê berjor bikî stûyê wê dirêj dibe.

Gava serê dergûşê dişon û stûyê wê berjor dikişînin û dirêj dikin, dibêjin stûyê wê pê dirêj dibe.

2 meres: pêlav, sol.

Lîstika gumbila gumbil

Payîz Tursun ▶

Zihêrê Marî

Yakûp Taşçi ▶

